# Ronahî

şopdara rastiyê ye

www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 572 25-Adar- 2019 Rojnameya Siyasî û Çandî


# NIHA JÎ DEMA RIZGARKIRINA EFRÎNÊ YE

Piştî ku Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê bi temamî DAIŞ li Sûriyê têk bir niha jî çavên herkesî vegeriya ye li ser rizgarkirina Efrînê ji dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê.



## PÎROZBAHIYÊN SERKETINÊ DIDOMIN

Piştî tekoşîn û berxwedaneke bê hemba ya şervan û gelên Bakurê Sûriyê roja 23'ê Adarê Hêzên Sûriya Demokratîk bi merasîmekê têkçûna DAIŞ'ê ya li ser axa Sûriyê bi temamî ji cîhanê re ragihand. Gelek hêz dewletan ev serketina QSD'ê bi peyaman pîroz kirin. Her wiha gelên Bakurê Sûriyê jî vê serketina mezin bi çalakiyên cur be cur pîroz dikin.

## EMÊ HERÊMÊN DAGIRKIRÎ RIZGAR BIKIN

Tevgera Ciwanên Şoreşger ya Sûriyê daxuyaniyek li Goristana Şehîd Dîcle ya Kobanê da û serketina QSD'ê pîroz kir. Di daxuyaniyê de hat diyar kir ku wê li ser şopa şehîdan Efrînê jî rizgar bikin. Meclisa Jinan a Minbicê û Rêveberiya Jinan a Tepqayê jî serkeftina QSD`ê pîroz kirin û diyar kirin ku di serî de Efrîn heta ku hemû herêmên di bin dagirkeriyê de rizgar bibin wê têkoşîna xwe dewam bikin.

## Li Girê Sipî serketina mezin hat pîroz kirin

Bi durûşmeya "Bi rihê Newrozê tecrîdê bişikînin û Efrînê rizgar bikin" Newroza 2019an li Girê Spî bi beşdariya hezaran kesî li parka Giştî ya li Çerxerêya El Elem hat pîrozkirin. Di pîrozbahiyê de Hevserokên Meclisa Kantona Girê Spî Hêvîn Îsmaîl û Hemîd Ebid û Hevseroka Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Bêrîvan Xalid axivîn û Newroz û serkeftina li dijî çeteyên DAIŞ'ê pîroz kirin û gotin, "Şahî û kêfxweşiya din wê bi rizgarkirina bajarê Efrînê be û gava duyem piştî têkbirina DAIŞ'ê, rizgarkirina bajarê Efrînê ye."



## Heta ku tecrîd û faşîzm têk biçe wê berxwedan dewam bike



Newroza li Stenbolê ya Tirkiyê bi şîara "Em ê teqez bi ser bikevin û tecrîdê bişikînin" bi coşek mezin hat lidarxistin. Bi deh hezaran kes tevî hemû astengiyan jî beşdarî pîrozbahiya Newrozê bûn. Di Newrozê de axaftin hatin kirin û peyam hatin xwendin. Di peyama hevpar ya ku hat dayîn de hat gotin ku heta tecrîd bişikî û faşîzm têk biçe wê berxwedan berdewam bike.

## Divê partiyên Kurd xwe nekin hembêza dagirkeran

Berdevkê Komîteya Têkiliyên Dîplomasiyê ya KNK'ê ya Rojava Dilawer Zengî di derbarê xebatên wan de axivî û diyar kir, partiyên ku li dijî yekitiyê disekinin, wê gel hesabê ji wan bixwaze. Zengî anî ziman ku di encama qonaxa yekemîn ya KNK`ê de 28 partiyan banga yekitiyê erê kiriye lê belê ENKS û Partiya Pêşverû ti bersivek nedane.

Zengî wiha dewam kir, "Êdî veger ji vî karî tune ye û pêwîst e ev proje bi ser bikeve. Gelek partiyan navendên xwe li herêma Firat û Cizîrê vekirin. Tenê ENKS`ê heya niha navendên xwe venekirine. Xeta me ya sor ewlekariya netewî ye. Mafê tu partiyên kurd tine ku li ser navê kurdayetiyê xwe bixin hembêza dagirkerên Kurdistanê û rê li pêşiya êrîşan vekin."



## Gêrîla li Mêrdînê lê da , 6 leşker hatin kuştin

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên gerîla daxuyaniyeke nivîskî weşand. Di daxuyaniyê de hat gotin, "Di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Delal Amed û Şehîdên Bestayê de hêzên me li dijî leşkerên ku li navçeya Kerboranê ya Mêrdînê derketin operasyonê çalakiyek pêk anîn. Hêzên me li yekîneyeke operasyonê xistin û di encama derbên giran de 6 leşkerên dijmin hatin kuştin.

## Li Baxozê komek çeteyên DAIŞ'ê hatin girtin



Piştî ku têkçûna çeteyên DAIŞ'ê hat ragihandin şervanên QSD'ê pili gundê Baxozê xebatên paqijkirin û lêgerînê didomînin. Di çarçoveya xebatên lêgerînê de li gundê Baxozê komeke çeteyên DAIŞ'ê yên ku xwe di xendekan de veşartibûn, hatin girtin.

## Zehra Saglam li dijî tecrîdê çalakiya fedayî kir, şehîd bû



Çalakî û berxwedanên li dijî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dewam dikin. Piştî Zulkuf Gezen, Ayten Beçet girtîya ji doza PAJK'ê Zehra Saglam jî li dijî tecrîda li ser Rêber Ocalan çalakiyeke fedayî kir û şehîd bû. Malbata Zehra Saglam ji bo cenazeyê keça xwe werbigire çûn bajarê Erzîromê.

## Leyla Guven: Çalakiyên me wê bi ser bikevin

Hevseroka KCD'ê Leyla Guven li ser çalakiyên fedayî yên li zindanan û derve tên lidarxistin peyamek da û xwest, çalakiyên bi vî rengî neyên kirin, lê berxwedana heyî bê mezinkirin û wiha got, " Wê teqez çalakiyên me encamê bigire, teqez bi ser bikeve. Em roja bidawîbûna tecrîdê bi hev re pîroz bikin."

